



Ji bo kesê ku li Swêdê serî li penaberiyê dide

Till dig som söker asyl i Sverige
Kurmandji

www.migrationsverket.se

Ji bo kesê ku li Swêdê serî li penaberiyê dide

Hejmarek civîn

Eger li Swêd li serlêdana te bê nerîn, heta ku Daîreya Koçê derheqê mafê rûniştinê de biryarekê bide tu dikanî li vira bî.

Daîreya Koçê ji bo civînan dê çend caran gazî te bike. Di lêkolîna penaberiyê de tu yê derheqê sedemên penaberiya xwe de biaxivî, ango bê ji bo çî tu doza sitarê li Swêdê dikî. Hatina te ya van civînan girîng e.

Carekê jî dê ji bo agahdariyeke komî gazî te bê kirin. Di civînê de Daîreya Koçê dê behsa wan tiştan bike ku gava mirov penaxwaz e girînge mirov bizanibe. Ew wek mînak dikare derbarê xanî, aborî, tendurustî û lênerînê de be. Derbarê pêvajoya penaberiya Swêd de jî bêhtir agahî tên dayîn. Agahiyên derbarê qanûnan, dezgeh û rêxistinên elaqedar, wek nimûnê yên ku alîkariyê didine penaberan di vê civînê de tên dayîn. Ev agahî pir girîng in û heta ku tu li benda biryarekê bî tê ji wan sûd wergirî.

Behsa xwe bike

Daîreya Koçê dê bipirse bê tu kî yî. Ji bo ku Daîreya Koçê biryareke rast bide girîng e tu nasnameya xwe nîşan bidî. Paseport yan belgeyên din yên nasnameya xwe bi xwe re bibe Daîreya Koçê. Belge divê nîşan bidin bê navê te çî ye, tu kengî çêbûye û tu welatîyê kû yî. Eger belgeyên nasnameya te nebin divê tu hewl bidî bi awayekî din nîşan bidî bê tu kî yî. Wek nimûne tu dikanî bi belgeya jidayikbûnê, deftera malbatê, deftera leşkeriyê yan belgeya mehrbirînê nîşan bidî.

Hin pirsên derheqê paşxane û malbata te jî dê bên kirin. Bila li bîra te be, gava tu serlêdana penaberiyê dikî her tiştê ser malbata xwe bêje. Ji bo ku eger hat û te mafê penaberiyê stand û tu bixwazibî li Swêdê bigihîjî malbata xwe ev agahî girîng in.

Sedemên te

Kes wekî te nizane bê ji bo çî te welatê xwe terk kiriye. Lewre girîng e tu behsa her tiştê hatî serê te bikî û rave bikî bê di vegereke muhtemel de tu dikanî bikevî çî rewşê de. Divê tu behs bikî bê çî hatiye serê te bi xwe, ne tenê behsa rewşa welatê xwe bikî. Tenê dema her tiştê girîng te gotibe Daîreya Koçê dikane nirxandineke durist li ser rewşa te bike. Ji bo wergirtina agahiyên girîng li ser penaberiyê, dabaşnêr wê bi pirsên xwe alîkariya te bike.

Serpêhatiyên behskirina wan dijwar

Hin tişt zehmet in mirov behsa wan bike, lê dibe ku vegotina wan zêde girîng be. Erka sirveşartina dabaşnêr heye, ew tenê dikane bi karmendên din yên ku bi serlêdana te re mijûl in behsa gotinên te bike. Eyn mîna dabaşnêr wergêr jî xwediyê erka sirveşartinê ye. Berya lêkolîna penaberiyê tu dikanî bêjî bê tu dabaşnêrekî mêr yan jin tercîh dikî. pêwist be tu dikanî di lêkolînê de doza bêhnvedanekê bikî. Belge û ewraqên din ku gotinên te piştrast dikin, yan zanyariyên li ser welatê xwe tu dikanî bi xwe re bibî. pêwist be Daîreya Koçê belgeyan tercime dike.

Tu dikanî tesîrê bikî

Eger tu werî wextên ku Daîreya Koçê ji te re dişîne bersiva serlêdana te zûtir dikane bê dayîn.

Navnîşan û hejmara telefona xwe bide Daîreya Koçê da ku bikanibin têkiliyê bi te re deynin. Ji bo ku tu ji agahiyên Daîreya Koçê haydar bibî posta xwe herdem bixwîne. Eger tu navnîşanê biguherî Daîreya Koçê agahdar bike.

Awayekî din ku tu dikanî tesîrê bikî da bersiva serlêdana te zû bê dayin îsbatkirina nasnameya te ye. Bi paseport yan nasnameyên din tu ji Daîreya Koçê re nîşan didî bê tu kî yî. Eger tu di îsbatkirina nasnameya xwe de alîkariyê bikî bi texmîneke mezin heta tu li benda bersivekê yî tê bikanibî kar bikî.

Di dema payînê de

Alîkariya hiqûqî

Piraniya kesên ku doza penaberiyê dikan mafê wan yê alîkarekî resmî heye. Piraniya caran hiqûqzanekî bi perwerde dê berjewendiyên te biparêze û heta ku Daîreya Koçê li serlêdana te binêre ew dê desteka hiqûqî bide te.

Daîreya Koçê alîkarê resmî tayîn dike û pereyên wî dide, lê alîkar ne girêdayî Daîreya Koçê yan tu dezgehên din e, ew serbixwe kar dike. Kesekî baweriyaya te pê hebe tu dikanî pêşniyaz bikî, yan bixwazibî alîkarê te jin yan mêr be. Tu dikanî bi xwe jî alîkarekî bigrî û pereyên wî bidî, lê hingî Daîreya Koçê heqê wî nade.

Kar û rola terciman

Di gelek civînên bi Daîreya Koçê re ji bo wergerandina tiştên tîn gotin tercimanek beşdar dibe. Carinan terciman li odê ye, carna ser xeta telefonê û carna jî bi rêya ekranê beşdar dibe. Bila li bîra te be di navbera xebirdanê de bêhna xwe vede da ku terciman bigihe gotinên te wergerîne. Heta ew wergera xwe neqedîne jî tu dest bi xebirdanê neke.

Divê terciman li gor hin qaîdeyan bilivin. Berya wergerê ew ji her du aliyên re behsa rola xwe, erka sirveşartinê û mecbûriyeta ku hemû axavtinên di odê de tîn kirin wergerîne dike. Bê ku gotinekê jê kêr bike yan serve bike terciman her tiştî diwergerîne. Terciman qaliba-ez bi kar tîne. Terciman nêtar e, ango ew nêrînên li ser sîyaset, ol û tiştên din de dernabire. Terciman bêalî ye. Ango ew xwe tevlî nake, hewl nade alî terefekî bike, yan di dema sohbetê de ew nîşan nade ku aliyekî digre.

Eger tu ji terciman fam nekî, yan ji ber sedemên din pê re nerehetî girîng e tu bêjî. Tu dikanî civînê bibirî û tercimanek din bixwazî. Eger tu tercimanek jin yan mêr dixwazî berî civînê me agahdar bike. Li gor ku tu yê behsa çî bikî belkî baştir be ku zayenda te û terciman yek be, lê carna jî dikane berovajî be.

Rêxistinên dilxwaz

Mafê te ye tu têkiliyê bi rêxistinên dilxwaz re deynî û ew alîkariya te bikin. Daîreya Koçê dikane alîkariya te bike bê li cîyê tu lê dijî kîjan rêxistin hene. Hemû rêxistinên dilxwaz li cîyên biçûk nînin. tu bixwazibî bi rêxistineke taybet re têkiliyê deynî ji nivîsgeha tu diçiyê bipirse.

Karta LMA

Dema tu li Swêd doza penaberiyê dikî meqbûzeke serlêdanê tu werdigrî. Li ser meqbûzê hejmarek heye, gava tu li Daîreya Koçê geriyayî tu wê hejmarê didî. Bi vî awayî dabaşnêr agahiyên te zûtir dibîne. Çend rojan piştî serlêdanê du dikanî karta xwe ji nivîsgehê werbigrî. Navê kartê LMA-kort e û ew dikeve şûna meqbûzê de. Baş e ku karta LMA tim bi te re be da tu nîşan bidî ku tu penaxwazî û heta tu li benda biryarekê bî mafê te yê mayina li Swêd heye. Her cara ku tu çûyî nexweşxanê divê kart bi te re be da ku li te bê nêrîn.

Kar

Ji bo ku tu bikanîbî li Swêdê kar bikî destûra kar pêwist e, lê wek penaxwaz bê destûra kar jî tu dikanî kar bikî eger:

- Li Swêd li serlêdana te tê nêrîn
- Ji bo îsbatkirina nasnameya xwe tu alîkariyê dikî.
- Bingehê serlêdana te xurt e.

Eger tu van şertan bînî cî mafê te yê karkirinê heye. Eger mafê te yê kar hebe li ser karta LMA xala 7 ew nivîsandiye û delîla îstîsnaya destûra kar jî (AT-UND) li wir nivîsandiye.

Eger te kar kiribe û serlêdana te hatibe redkirin heta tu welêt biterikînî tu dikanî kar bikî, yan heta ku ji bo terkkirinê te hevkarî kiribe. Eger destûra rûniştinê ji te re were tu dikanî bi berdewamî kar bikî.

Ji bo peydakirina karên vala tu dikanî biçî Daîreya Giştî ya Karî (www.arbetsformedlingen.se). Eger mafê te yê karkirinê nebe jî tu dikanî li cîyekî kar praktîkê bikî.

Eger mecala te ya kar nîne û pereyên te bi xwe jî nebin mafê te yê standina tezmînatê heye. Pereyên tu distîni dê têra xwarin, cil û lêçûnên şexsî bikin. Eger tu ji Dîreya Koçê pereyan distîni girîng e ku dema rewşa te ya aborî hate guhertin tu wan agahdar bikî, wek nimûne eger tu dest bi kar bikî.

Lênerîna tendurustî û nexweşiyê

Tu yê ku li Swêd doza penaberiyê kiriye dikanî li nexweşxaneyekê belaş miayene bibî. Lênerîna tendurustiyê tesîrê li penaxwaziya te nake. Mafê te yê tedawiya acîl, lênerîna diranan û lênerîna yekser heye. Nexweşxane biryarê dide bê çî lênerîn dikane li te bê kirin. Eger tu karta xwe ya LMA nîşan bidî bi 50 kronî tu dikanî doktor bibînî yan derman bistîni. Zarok û ciwanên bin 18 salî re mîna zarok û ciwanên li Swêdê mafê wan heye belaş tedawî bibin.

Xanî

Tu dikanî ji xwe re xaniyekî peyda bikî yan bikevî xaniyekî ku Daîreya Koçê ji te re peyda dike. Eger Daîreya Koçê xanî ji te re bibîne nabe ku tu cî hilbijêrî û dibe ku tu neçar bibî bar bikî. Eger tu bi xwe xanî peyda bikî divê tu kirê ji kîsê xwe bidî.

Biryar

Eger tu destûra rûniştinê bistînî

Eger tu destûra rûniştinê bistînî tu dikanî li Swêd bijî û kar bikî. Dema destûr ji te re hat divê tu biçî Daîreya Bacê ya Giştî (Skatteverket) ji bo ku xwe qeyd bikî û hejmareke kesîn bistînî. Weke delîl ku te destûra rûniştinê standiye Daîreya Koçê karteke destûra rûniştinê dişîne navnîşana te.

Eger red ji te re were

Eger serlêdana te were redkirin tê wê wateyê ku li gor Daîreya Koçê sedemên mana te ya li Swêd têr nakin. red ji te re were du hilbijarkên te hene: tu dikanî biryarê bipejirînî û vegeŕî yan jî îtiraz bikî.

Eger tu biryarê bipejirînî gereke tu kaxeza bi navê vegotina razîbûnê îmze bikî. Piştî te ew îmze kir êdî tu nikanî îtiraz bikî û ji bo vegeŕa mal divê tu amadekariyan bikî.

Lê eger tu îtiraz bikî tê wê wateyê ku tu dixwazî dadgehek li biryara te binêre. Tu îtiraza xwe dişînî ji Daîreya Koçê re. Berya ku biryar bikeve ber muteberiyê de, ango herî dereng sê hefteyan piştî wergirtina biryarê divê te îtiraz kiribe. Eger alîkarê te yê resmî hebe ew dikane alîkariya te bike.

Pêşî Daîreya Koçê li îtiraza te dinêre ji bo ku mêze bike bê biryara xwe biguhere yan na. Eger Daîreya Koçê biryara xwe neguhere îtiraza te dişîne ji dadgeha koçê re. Eger hukimê dadgeha koçê ne bi dilê te be tu dikanî ji Dadgeha Bilind ya Koçê bixwazî ku ew lê binêrin.

Eger tu fikrê xwe biguherî û bixwazibî îtiraza xwe paşde bikişînî tu dikanî Daîreya Koçê agahdar bikî ku tu biryara redê dipejirînî. Hingî dadgeh îtiraza te betal dike û lê nanêre.

Di şertên normal de biryara redê çar salan derbas dibe. Eger di nava van salan de tu vegeŕî Swêdê tu dikanî ji nû ve bê redkirin yan dersînorkirin. Hingî mafê te nîne ku Daîreya Koçê li doza te binêre yan destekê bide te.

Vegeŕ

Ji roja ku biryara redê derbas bû û pê de demek tê dayin da tu bi riza xwe welêt biterikînî. Di biryarê de nivîsandiye bê çiqas wextê te heye û tu bi xwe berpîrsiyarî ku di wext de derkevî. Ji bo vegeŕa welatê xwe yan dewleteke din ku mafê te lê heye tu dikanî ji Daîreya Koçê alîkariyê wergirî. Wek mînak Daîreya Koçê dikane di mesela têkiliyên bi welatê te re yan ji bo pilankirina rêwîtiyê alîkariya te bike. Kesên ji hin welatan dikanin piştgiriya aborî jî wergirin da ku li welatê xwe bi kêrî xwe werin. Pîrsên desteka vegeŕê ji dabaşnêra xwe bike.

Eger tu di wextê ku biryar li ser hatiye dayîn de Swêd neterikînî vegeŕa te dikane bê qedexekirin. Hingî heta salekê tu nikanî têkevî welatên herêma Şengenê, Bûlgarîstan û Romanya. Girîng e tu bi xwe bizanibî kengî divê tu welêt biterikînî.

Eger red ji te re hatibe û tu di lêkolînê de hevkarîyê nekî dîsvegera te heta pênc salan dikane bê qedexekirin. Wek nimûne girînge tu agahiyên rast bidî û nasnameya xwe nîşan bidî.

Eger tu hevkarîyê nekî

Eger Daîreya Koçê di wê qenaetê de be ku tu ji bo vegeerê bi wan re hevkarîyê nakî ew dikane pereyên rojê kêmkirî bike, te bêxin bin çavlêyî yan bin çavdêriyê heta ku tu bê şandin. Çavlêyî tê wateya ku tu birêkûpêk di wext û cihên diyarkirî de xwe bidî nîşandan. Ev herwiha dikane bê wateya ku tu divê paseport û nasnameyên xwe yê din bidî. Xistina bin çavdêriyê tê wateya ku tu li stargehekê tê girtin û tu nikanî ji wir derkevi. Stargeh ji aliyê Daîreya Koçê ve tê birêvebirin.

Eger Daîreya Koçê di wê qenaetê de be ku ji ber ku tu bi wan re hevkarîyê nakî red û dersînorkirina te negengaz e ew dikane berpirsiyariyê dewrî polîs bike da ku tu ji welêt derkevi. Hingî heqê polîs heye ku li te bigere. Heqê polîs herwiha heye ku te bi zorê ji welêt derxe. Eger berpirsiyariya dersînorkirina te çûbe cem polîs, pirsên derheqê vegeerê de jî divê tu ji wan bikî.

Agahiya nû

Eger piştî reda dawî agahiyên nû bên, Daîreya Koçê dikane binêre bê ew dibin sedem ku tu neyî şandin. Wek mînak rewşa welatê te xerabtir bûbe yan tu giran nexweş ketibî. Daîreya Koçê dikane bi însiyatîfa xwe bi xwe yan jî bi daxwaza te lê binêre.

Sedemên penaberîyê

Swêdê peymanî penaberan ya NY û qaîdeyên hevbêş yê YE îmza kiriye. Ev tê wê wateyê ku Swêd li girtî serlêdanên penaberîyê ferdî dinêre. Swêd mafê rûniştinê dide kesê penaber yan yê ku ji ber sedemên din pêdiviya wan bi parastinê heye. Daîreya Koçê pêşî dinêre bê tu penaberî, paşê bê pêdiviya te bi parastina alternatîv heye, yan ji ber sedemên din muhtacê parastinê yî.

Penaber

Li gor peyamana penaberan, qanûna swêdî û qaîdeyên YE eger sedemên te yê bingehîn hebin û tu ji ber sedemên jêr ji welatê xwe mehkûmî tu penaberî:

- Nijad
- Netew
- Ol yan qenaeta sîyasî
- Rabûrûniştina cinsî
- Girêdana koma civak.

Sedema tahdeya te dikane rayedarên li welatê te bin. Lê dibe ku rayedar nikanin yan naxwazin te û komên berxeter biparêzin.

Eger statuya te ya penaberîyê nebe jî ku pêdiviya parastinê hebe mafê te yê rûniştinê dikane hebe. Dibe ku parastina alternatîv yan wek din pêwîst be.

Pêdiviya parastina alternatîv

Li gor qanûnê pêdiviya te bi parastina alternatîv heye eger xeterên jêr hebin:

- Cezayê kuştinê hebe
- Cezayê laş, îşkence, ceza yan muameleyeke din ya dermîrovî hebe
- Wek kesekî sivil xeterek mezin hebe ku di nakokiyên çekdarî de birîndar bibî.

Pêdiviya parastina wek din

Li gor qanûnê pêdiviya te bi parastina wek din heye eger xeterên jêr hebin:

- Nakokiyên çekdarî yên derve yan hundir yan dijîtiyên din yên giran li welêt
- Tirseke jidil hebe ku destdirêjî li te dê bê kirin
- Ji ber felaketên jîngehî tu nikanî vegeerî welatê xwe.

Têgeha pêdiviya parastina wek din tenê di qanûna swêdî de heye û tenê li Swêd derbas dibe.

Eger tu bêhtir agahî bixwazî

Ji bo hejmarek civîn gaziya te dê bê kirin û li wir tê bê agahdarkirin bê di dema payînê de girînge mirov çî bizane. Dabaşnêr dê li ser wek nimûne xanî, aborî, tedawî û dibistana zarokan de agahiyan bide û behs bike bê tu dikanî çî alîkariyê wergirî. Dema agahiyên nû pêwîst bûn ji bo ku te agahdar bike nivîsgeha te dê bangî te bike. Gava biryarek ji te re hat dabaşnêrek dê rave bike bê biryar ji te re tê çî wateyê.